Kurdistan

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriye 1957

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Tebax / 1 - 8 - 2022 Kurdistan-Hejmar (226) www.pdk-s.com

# Hebûna PKK rewşa xelkê Kurdistana Sûriyê dixe metirsiyê de

Kurdistan **Cîhad Hisên**



Di vê dema dawî de, Artêşa Tirkiyê bi rêya dronan û firokeyên bê firokvan serkirde û endamên PKK yên ku niha li Kurdistana Sûriyê ne dike armanc û ji destpêka vê sale ve zêdetirî 35 caran êrîş hatine kirin, êrîşên bi dronan metirsî li nava xelkê dirust kiriye. Rojnameya Kurdistan nerîna welatiyan di vê derbarê de wergirtiye. Welatiyek dibêje, hebûna PKK li deverên pirsgirêkeke mezin e û metirsî ye li ser jiyana wan, û pêwîste endam û çekdarên PKK ji Kurdistana Sûriyê derkevin û cihê şerê xwe bibin Bakurê Kurdistanê, Tirkiyê hebûna wan wek hincet dibîne, lewma van êrîşan encam dide. Welatiyekî din jî dibêje, bi rastî cihê xebata PKK ne Kurdistana Sûriyê, niha ji ber hebûna wan Tirkiyê har û dîn bûye, û dixwaze êrîşî deverên me bike, ji ber van êrîşan xelk di tirseke mezin de dijîn, û ew nikarin nêzîkî gelek cihan bibin, ew jî ji tirsa dronan.

# ENKS
# hêviya xelkê li Kurdistana Sûriyê ye

Kurdistan-
Hozan Cemîl




Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) bi daxuyaniyekê ragihand, wan civîna xwe ya asayî di 19ê Tîrmeha 2022an de li bajarê Qamişlo li dar xistine û di civînê de pêşhatên dawî yên li Sûriyê û Kurdistanê û mekanîzmayên lidarxistina Çaremîn Konferansa Encûmena Niştimanî ya Kurdî gotûbêj kirine. Di daxuyaniya ENKSê de hat diyarkirin: “Civînê bi nirxandina serdana şanda partiyên encûmenê bo Herêma Kurdistanê û civîna li gel cenabê Serok Mesûd Barzanî dest pê kir û di wê hevdîtinê de cenabê wî tekezî li ser berdewamiya piştevaniya xwe bo doza Kurd a li Sûriyê û xebatên ji bo çareserkirina pirsgirêkan û çareserkirina daxwazên penaberên Sûrî yên li Herêmê kir. Civînê pesnê helwesta cenabê wî li ser piştgiriya gelê Kurd di hemû astan de kir û ENKSê baweriya xwe bi serkirdetiya wî ya bi hîkmet a ji bo miletê Kurd anî ziman.” Hat eşkerekirin: “Di civînê de li ser têgihiştinên aliyên ENKSê hate gotûbêjkirin, ku di serî de lidarxistina Çaremîn Kongreya Niştimanî ya Kurd di demeke nêzîk de, di civînê de piştî çend guhertinan madeyên rêxistinî hatin pesendkirin û piştre komîteyên çavdêriya hilbijartinan hatin avakirin.” ENKSê diyar dike: “Gefên Tirkiyê li ser dagirkirina navçeyên din ên Sûriyê berdewam in û ji ber vê yekê, nîgeranî û alozî di nav welatiyan de derketiye holê.” Herwiha destnîşan kir: “Di vê derbarê de, di civînê de daxwaz ji civaka navdewletî hate kirin ku rê li destwerdana Tirkiyê bigrin, ji ber ku encamên cidî yên li ser wêranî, xerabî û pêlên koçberî û penaberiyê derdikevin holê.” Di civînê de binpêkirinên berdewam ên li dijî gelê Efrînê, Serê Kaniyê û Girê Spî hatine şermezarkirin û ji civaka navdewletî hatiye xwestin ku dawî li vê yekê were anîn, berpirsyarên vê yekê werin darizandin û kesên ku ziyan dîtine werin qerebûkirin û bi destê şêniyên wê yên resen werin birêvebirin.



Herwiha tedbîrên pêwîst ji bo rêgirtina li guhertina demografiyê û vegerandina ewle ya xelkê bo deverên xwe yên resen û vegerandina milkên wan ên dizî û desteserkirî werin pêkanîn. Di dawiya civînê de, amadebûyan tekezî li ser girîngî û pêwîstiya lidarxistina Çaremîn Kongreya Niştimanî ya Kurdî kirin. Derbarê Konferansa Encûmena Niştimanî ya Kurdî gelek karvedan hene, û xelkê Kurdistana Sûriyê li hêviya guhertin û biryarên cidî ne, û hêviya wan ji vê konferansê heye. Welatiyek bi navê Mihemed Elî li ser vê mijarê wiha dibêje, pêwîste di vî kongirî de bêhtir guhdan bi pirsên girêdayî xelk, û ENKS bêhtir ji xelk û alîgirên xwe nêzîk be, heta ku bikarine wan nêzîkî xwe bike û jêr dûr nekevin, û wek berya niha nike û nekeve şaştiyên berê, ku gelek alî û kes dûrî xwe xistibûn.Welatiyekî din dibêje, Encûmena Niştimanî ya Kurdî keyanekî Kurd perwer û niştîmanperwer e li Kurdistana Sûriyê û hertim daxwaza mafên gelê Kurd û doza wî dike, û dest ji van mafan jî bernade, lewma bihêzbûna ENKS ji bo doza gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê baş e, û pêwîste hemû alî piştevaniya wê bikin heta ku bihêz bimîne.Divê kesayetiyên nû yên serbixwe bikevin nava ENKS û guhertineke cidî çê bibe. Selah Ebdulîlah jî dibêje, guhertin û rewanekî nû ji bo Encûmena Niştimanî ya Kurdî ENKS pêwîst e, lewma divê rêjeya jin û ciwanan were zêdekirin, heta ku karekî baş were kirin, bi avakirina ENKS hêviyek mezin li cem xelkê Kurdistana Sûriyê çê bû, lewma em naxwazin ew hêvî nemîne, û xelk piştevaniya ENKS bigrin û cemawerên wê mîna berê vegerin.

# Vegerandina rufatên 100 Barzaniyên enfalkirî








**Kurdistan-Bidûvçûn**

Piştî vekirina gorên wan, rufatên 100 Barzaniyên enfalkirî ji bo Herêma Kurdistanê hatin vegerandin û li devera Barzan bi xakê hatin spartin.
Li gorî daxuyaniya Rêveberiya Karûbarên Şehîd û Enfalkiriyan rufatên 100 Barzaniyan ji beyabana Erer ya li parêzgeha Mosene ya başûrê Iraqê bi riya Firokxaneya Navdewletî ya Hewlêrê bo Herêma Kurdistanê hatin vegerandin û roja 31ê Tîrmehê jî di merasîmeke taybet de li devera Barzan bi xakê hatin spartin.
Di dawiya sala 2021ê de, nûçeya dîtina goreke bikomî li parêzgeha Mosene belav bû, saziyên pêwendîdar ên Herêma Kurdistanê jî bi aliyên pêwendîdar ên Hikûmeta Federal re roja 15ê Sibata 2022an de gihîştin cihê gorê ya li navçeya Efayiq ku nêzîkî sînorê Kuwêt û Siûdiyê ye û tîmên wan bi awayekî zanistî dest bi proseya vekirina gorê kirin. Di roja yekem de jî bi dîtina cilûberg û cemedanên taybet ên Barzaniyan, diyar bû ku qurbaniyên wê gorê yên peya û gencên Barzaniyan in û di sala 1983an de hatine enfalkirin.
Piştî dîtina gorên 100 Barzaniyan li beyabana Erer ku ji aliyê rêjîma Beis a rûxandî ve bi guleyan hatibûn kuştin û bi şofil ax bi ser de kiribûn, termên wan bi awayekî zanistî bo Bexdayê hatin veguhastin..
Jenosîda Barzaniyan di sala 31. 07. 1983an de li ser çend qonaxan ji aliyê rejîma Beis a hilweşiyayî ve dest pê kir û zêdetirî 8 hezar peya û gencên Barzanî enfal kirin û piştî wê jî bi çend qonaxan bi sedan hezar Kurdên din li çend navçeyên cuda cuda yên Başûrê Kurdistanê proseya Enfal (Bi zindî çalkirin û bê serûşûn kirin) dest pê kir.
Proseya lêgerîna li termên enfalkiriyên Kurdistanê bi giştî, yek ji karên pêşîne yên Serok Mesûd Barzanî bû, piştî rûxandina rêjîma Beis di sala 2003an de, ew prose bi awayekî kirdarî dest pê kir. Di sala 2004an de, termên 513 Barzaniyên enfalkirî ji goreke bikomî ya li beyabana parêzgeha Mosene hatin dîtin û sala 2005an di merasîmekê de bi amadebûna Serok Barzanî, ew ji bo Herêma Kurdistanê hatin vegerandin û li goristaneke taybet ya bi enfalkiriyan li devera Barzanê bi xakê hatin sparstin. Di berdewamiya proseyê de, sala 2011an jî termên 93 peya û gencên Barzaniyên enfalkirî di goreke bikomî de li başûrê Iraqê hatin dîtin.
Rêjîma Beis a Iraqê berî sala 19871988-an di heyama 7 mehan de û di çarçoveya 8 qonaxan de, proseya enfalkirina gelê Kurdistanê pêk anî. Di wê tawanê de rêjîma Beis zêdetir ji 4 hezar û 500 gundên Kurdistanê û bi sedan bajarok û zozan wêran kirin û xelkê wê ber bi çarenivîseke nediyar ve birin. Di koma heşt qonaxên proseya Enfalê de, rêjîma Beiş ya rûxyayî 182 hezar Kurd enfal kirin.


# Kiryara revandina zarokan berdewam e

**Kurdistan**

Revandina zarokan li Kurdistana Sûriyê û ji taxên Kurdî li Helebê û kampên Şehbayê ji aliyê ciwanên ser bi PYD ve berdewame.




Rêxistina Ciwanên Şoreşger a ser bi Partiya Yekîtiya demoqratîk PYD ve, zarokeke din a 14 salî ji taxa Şêx Meqsûda Helebê revandiye û ew birin navendeke leşkerî.
Tora Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûrê ragihand, keça 14 salî Emîra Xalid Şêxo roja 172022/7/ li taxa Şêx Meqsûda Helebê ji aliyê Tevegra Ciwanên Şoreşger ve hatiye revandin û ji bo navendeke leşkerî hatiye birin.
Tora Çavdêriya Mafên Mirovan diyar kir, Emîra Xalid Şêxo ji gundê Qasim ê navçeya Raco ya Efrînê ye û bi malbata xwe re koçberî taxa Şêx Meqsûd a Helebê bûye.
Ji bajarê Kobanê yê Kurdistana Sûriyê jî çekdarên PYDê zarokeke Kurd revand. Zarok, bi navê Meryem Ebdulah Elî ye, di 7ê Tîrmeha îsal de hatiye revandin.
Herwiha Mihemed Edhem , ji 12ê Berçileya 2016an ve li bajarê Efrîna yê Kurdistana Sûriyê hatibû revandin. Ta niha çarenivîsa wî ne diyar e, û ew jidayikbûyî sala 2001ê ye, û dema hatibû revandin temenê wî jêr 18 salan bû.
Ji dema kontrolkirina herêma Efrînê ji aliyê artêşa Tirkiyê û grûpên çekdar ên ser bi wê ve di Adara 2018an de, zêdetir ji 300 hezar kes ji Efrînê koçber bûn û hejmarek mezin ji wan li herêma Şehba ya li bakurê Helebê û taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê yên Helebê bi cih bûn.
Malbatên zarokên revandî kiryarên Tevgera Ciwanên Şoreşger şermezar dikin û bang li rêxistinên ku girîngiyê didin mafên zarokan, rêxistinên navdewletî û aliyên pêwendîdar dikin ku fişarê li Rêveberiya PYD û Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD bikin ta ku çarenivîsa zarokên wan diyar bikin. Tevî ku HSDê di Hezîrana 2019an de bi Netewên Yekbûyî re planek ji bo bidawîkirin û qedexekirina tevlîkirina zarokan di nava çekaran de îmze kiribû. Lê ji dema ku peyman hatiye îmzekirin ve, rewşa revandina zarokan bi dawî nebûye.



# Mahir Hesen Dîwana bi navê "Keniya te" belav dike






Kurdistan-
Soz Xelîl

Nivîskar û helbestvan Mahir Hesen dîwana xwe ya bi navê "Keniya te" belav dike, ew dibêje wî helbesta rêzbend hilbijartiye ji ber ku nivîskarên Kurd ev şêweyê helbestê piştguh kirine.

*Çima te ev nav ji bo dîwana xwe hilbijartiye?
Destpêkê de ez dixwazim bêjim çima min Helbesta Rêzbend hilbijart û paşî li ser nav rawestin , Nivîskarên Kurd helbestên rêzbend paşguh dixin û wan nenivîsînin, piştî ku peşek pir mezin ji nivîskaran berê xwe dane romanan û xwe ji helbestan vekişînin, an xwe ji wan dûr xistin - û mebesta min ne ew bi rêça helbestên rêzbend nêzkî xîwneran bibim, girseya xwendevanên kurd, bi awayên ku herî zêde bala wan helbestan dikişîne, û yên ku ji rola helbestê bêhêvî dibin di heyama xwendina romanan an jî çîrokan diçin, rêjiya wan pir kême.
Û sedema hilbijartina Nav, Navê Pirtûkan divê ji bo xwîneran balkêş be, ji bilî vê, hilbijartina nav bi mijara pirtûkê ve girêdayî ye, da ku qada xwendin û pisporiya wê nîşan bide, ji lewma çi pirtûk be Navnîşan pir girîng e, Çimkî Ew ê xwîneran bikişîne.

* Naveroka dîwana te çi ye? Û gelo şêweyê helbestan klasîk yan nûjen in?
Naveroka pirtûkê ji berhevoka helbestên ku bi awayê kilasîk, ango birêkûpêk û em jê re dibêjin Helbestên rêzbend û bi zimanê erebî tê gotin, helbesta Stûnî û helbestên di nava qab vê pirtûkê ên li ser evînê hatine nivîsandin.

*Berhemên te çend in?
Min heta niha du pirtûk çap kirine, yek li ser lêkolînê û ya din jî li ser helbestê ye û pirtûkeke din jî heye ku ez ê di demeke pêş de ragihînim, herwiha min dest bi nivîsandina romanekê kir û bi baweriya min dê gelek dem bigre. Roman ji nivîsên din cudatir e Ji xeynî wê min gelek gotar û çîrokên ramanî nivîsandin. Ez bi Erebî û Kurdî dinivîsim û gotar bi zaravaya Badînî û Soranî hatine wergerandin.

* Kengî Mahir Hesen dest bi nivîsandina bi Zimanê Kurdî kir?
Ez hînî zimanê kurdî bûm dema ku ez dibistana navîn, pola heftan bûm, di wê demê de mamosteyê dersa neteweyî rojek hat cem me û li min xist, ji ber ku min jê pirsî çima hûn dibêjin em Ereb in, em Kurd in û ez bawerdikim ku tenê pênc kes ji Erebên vê derê ne, em hemû Kurd in. Paşê ez birim cem rêverberoya dibistanê û wî jî li min xist û hefteyekê ji dibistanê qedexe kirim. Paşî min soz da ku ez li nivîsandina ziman kurdî xwedî derkevim û fêr bibim û çend pirtûk ketin destê min, ji wan Ferhenga Kurdî-Erebî ya Elî Seydo Kuranî bû, ku di destpêka ferhengê de çawaniya bilêvkirina tîpan hatiye nivîsandin.

*Rola helbestê di civaka Kurdî de çi ye?
Roleke taybet a Helbestê di pêvajoya parastin û zengînkirina ziman de heye û dilîze û ew ji bo pêşdebirina rewanbêjî û bilêvkirina ziman û axaftinên zelal gelek giringiya xwe heye.
Helbesta kurdî yek ji têgehên nû yên rewşenbîrî tê nasîn ku ji bo bergirîkirina di ber peyva rastiyê de, û eşkerekirina bêdadî, û hember stemkaran û zorkaran helbestvanên kurd gelek zehmetî kişandine, û bi vî awayî ev têgeh derûniyeke rewşenbîrî ya saxlem nîşan dide, û sernavekî pêşverû ye.
Helbest nîşana serpêhatiyên mirovî ye, çavkaniya zanîna mirovî ye û keştiyek çandî ya domdar e.

*Tu tenê helbestê dinivîsînî, yan di warên din de jî?
Weku min li jor diyar kir, di gelek warên din de jî dinvîsim, li gorî min, tu sînor ji bo nivîskaran nayê danîn, çi helbest be çi roman be hwd...

* Xwendin û guhdana bi Zimanê Kurdî çawa dibînî?
Zimanê Kurdî alaveke hevnasînê ye di navbera milyonên kurdan ku li asoyên dinyayê belav bûne û esl û koka xwe teqes dikin bi ziman , bi saya taybetmendî nû bûye. Miletê kurd miletekî bindestî gelek dîtiye lê her bi zimanê xwe stemkar rawestandine, û xebata tê de bi gotin û gotinê ve girêdayî ye, ziman di jiyana her miletekî de xwedî girîngî û nirxek mezin e. Zimanê kurdî ew amûr e ku çanda me bi sedsalan veguhestiye û bi wî awayî, nifş bi nifş di heyamên dirêj de bi yek zimanî diaxive û raman dike, yasa û hestên xwe bi yek zimanî formule dike. Zimanê kurdî gihaiya asteke berz û bilind û zarokên kurdan êdî bi rehetî li ziman xwedî derdikevin.

* Gotina te ya dawî?
Gelek spasiya we dikim bo keda we a pîroz û her serkeftinê bo karê we dixwazim, û silavên dilî bo xwînera

**Mahir Hesen kî ye**

Mahir Hesen li devera Dêrikê jidayîk bûye, li Qamişlo mezin bûye, û ji sala 2016an ve li Elmanya dijî, niha jî Zanîngehê dixwînî.

## Nema karim



Şefîq Îsa

Li xwe geryam li qada te
Dizanim ku ji hev par im
Li ber çavan diyar im yek
Bi rastî ez sed û çar im
Li Dêmên te fena Roj im
Di nêv porê te êvar im
Li ser lêvê te sorav im
Te geh miştim ,te geh
xwarim
Veşêre min di pêsîrê
Li gelyê Gerdenê sar im
Ez ê deryan li xwe dadim
Ez ê agir li xwe darim
Penaber bûm li wê bejnê
Li cîhana te awar im
Mi xwe avêtî bextê te
Wisa winda nema karim

